Destpêka saleke nû

Hersal, piştî encamên bekeloriya tên der, xwendekar û xwediyên wan dikevin pirs û gelegomeke mezin. Pirsgirêk sal ji salê mezintir û girantir dibe. Hîsal dîsa deriyên zanîngehê li deh hezaran qutabî hatin girtin û li derve man. Ne ji ber ku pileyên hemiyan nizm in û ne liyaqî xwendinê ne, na, ji siyaseta dewletê tê, dewlet siyaseteke perwerdeyî ye pir çewt dimeşîne, sal ji salê xirabtir dike, Qotabî jî temenê dindin. Eger em hîn bifkirin, welat teva ji ber biryarên dewletê yên çepel temenê dide.

Li Sûryayê, jerkî partiya Al-Be's textê dewletê standiye, biryarên paqij, li ser bingehek rastgoyî ku berjewendiyên welêt û welatî biparêzin netên stadin. Biryarek çiqas xuyan dibe ku li gor berjewendiya gel e, di paş de destên reş û berjewendiyên kesane yên gemarî hene. Em werin ser xwendina zanêngehî. Li gor destûrê dewletê, xwendin ji welatiyên Sûrî re belaş e. Lê dîsa jî, ji pêk anîna hin berjewendiyan tevane, ne xeme di ser destûr re were gav kirin û zanîngehên taybet vebin. Lê gerek ewên fermî bimînin belaş. Eger di hundur zanîngeha fermî de, hin qutabî bi peran jî bixwînin, xelkê wê jî qebûl dike. Lê ya ku hîç netê qebûlkirin, çima dê asta pileyên qebûlkirinê di zanîngehên dewletê de ewqas bilind bin, û ji zanîngehên taybet re nizim bin. Di vir de dîsa bîna kufkî ya dewletî û partiya El-Be's dikele. Di vê ton siyaset û biryarên di derbarî xwendinê di zanîngehên Sûriyê yên fermî de, du tişt tên dîtin. **Yek**, tiştên di destur de, di derbarî bêpretiya xwendinê de hene, berebere dev jê tê berdan. Hinbihin, deriyê zanîngehê dewletê li pêş kurên û feqîrfiqaran tê girtin û zanîngehên taybet şûnê digrin. Eger ne wilo ye, çima ewqas ferq di navbera pileyê ku zanîngehên fermî dixwazin û yên taybet de heye. Tekûze ku hevpariyek dê di navbera xwediyên zanîngehên taybet û perpirsyarê dewletê hebe. Ev jî ji sinciyên parta Be's û berpirsyarên dewleta asayişane ye. Yên dibin qurban, li ber lingan derin zarokên me ne, em in, gel e, paşeroj e, welat e. Birastî hêviya gel di vê destlatê de hîç nemaye, hatiye birîn. Eger rojê deh kirasan biguhre, hemî alavên ragihandinê jî jê re bidin defê, sed zibalcî jî. 28-9-2005

Rastî Seriyan dişkîne.

Dîlan Zivigî

Bangîn hîn zarok bû , diya wî çûye dilovaniya xwedê û ew li ber destê dêmariyê mezin dibe . Wisan jî , pir kêm bi kesên derdora xwe re daxife , kêm caran nêrînên xwe , di babet û bûyeran de xûya dike . Ew bi gelemper hertim dibêje :Ez nizanim ! Vêca jî , di nêv xelikê gund de, bi Bangînê nezan û bûdele têye naskirin

Rojekê dêmariya wî, jê re digot : Bangîn! Kurê min! Va ye, tu mezin bûye û gihaye ciyê xort û mêran . Ma çêdibe ? Tu ji hemû tiştan re bibêjî, ez nizanim . Pêwîste, tu xwedî nêrîn bî, tiştên rast û ne rast ji hevdû cuda bikî û ji rastiyê re bêjî , ev rast e ! Kuro ma tu dizanî ku , xelikê gund ji te re dibêjin : Bangînê bûdele . Bangîn bi dengekî bilind dikeniya û digot : Dayê! **D.R.(7)**